

Ferqa di nêvbera »ko«, »ku« û »kû« de

Nêrînek Zimanewî

Arif Zêrevan

Hinek xwendevanên me carinan ji me re nameyan rêdikin û dipirsin ka çima em di portala Nefelê de gihaneka »ko«-yê bi »o«-yê dinivîsînin û ne bi »u«-ya kurt. Çend sebebên wê hene û ez dê li vê derê bi kurtî behsa hinekan bikim .

Berî hertiştî divêt ez bibêjim ko dengê »u«-ya kurt dengeke ji du dangan pêkhatî ye û eslê wî dengî



»wi« ye. Di hinek bêtayên kurdî de herdu dengên »wi« pir nêzîkî hev bûne û dengeke nû yê kurt jê çêbûye û Celadet Alî Bedir-Xanî ji wî dengî re »u«-ya kurt peyda kiriye. Yanê eslê bêjeya »Kurd, kurt, kurm, kum« û bêjeyên wekî wan »kwird, kwirt, kwirm, kwim« e lê belê ew paşê hatine guhartin. Heta niha jî li devera Botanê bêjeya »kurm û kum« wekî »kirm û kim« têne gotin yanê »w« dikeve û »i« dimîne. Vêca heçî gihaneka »ko«-yê ye nikare wekî »ku« bêt nivîsandin ji ber ew »o« ne ew »wi«-ya nêzîkîhevbiyê ye.

Di zimanê kurdî de sê bêje hene ko bi alfabeya erebî ji hev nayên vavêrkirin û hemî jî bi »kaf« û »wawê« yanê wekî »kw« têne nivîsandin. Ev hersê bêje hem dengên wan ji hev cuda ne û hem jî maneyên wan ji hev cuda ne ji ber hindê jî damezirênerê alfabeya kurdî ya latînî Celadet Alî Bedir-Xanî sê herfên cuda ji wan sê dengên cuda re peyda kirine û ew ji hev vavêrkirine. Piştî mirina Celadet Alî Bedir-Xanî hinek Kurdên ko bi alfabeya latînî dinivîsînin ferqa di nêvbera gihaneka »ko« û hokera »ku« de nedîtî û herduyan jî wekî »ku« dinivîsînin.

Ez dê berê behsa maneyên van bêjeyan yê cuda bikim û ji »Mem û Zînê« nimûneyan bidim:

ko: heger, **ku:** çî, çawa, **kû:** kîjan dever
Yê ko alfabeya kurdî ya latînî amade kiriye û dengên kurdî li wan herfan siwar kiriye Celadet Alî Bedir-Xan e. Wî ji bo gihaneka »ko«-yê herfa »o« bi kar aniye û bi zanebûn »u« bi kar naniye û »Hawar« hemî bi wî awayî derxistiye. Herçî »ku« ye ew bêjeyeka serbixwe ye û maneya wê yekcar cuda ye. Ev bêje li devera Hekariyan û Goyan pir belav e û di cihê »çî« û »çawa« de têt bi karanîn û Ehmedê Xanî jî ew bêje gelek caran di »Mem û Zînê« de bi kar aniye: {We zû şemirand ji bo çî sersal Hon rast bibên **ku** [çî, çawa] bûye ehwal? Hon bêjine min **ku** [çî] bû qediyê? Kengê li me xef dibit xebiyê Mecnûn **ko** [heger] nebit 'edilê Leylê Leylê **ku** [çawa] dikit bi Leyl meylê? Go ez **ku** [çî] bibêm bike tu bawer Dawer bi mi ra **ko** [heger] bûye yawer Em dê **ku** [çawa] heqîqetê 'eyan kin? Serrişteyê tuhmetê beyan kin Ger fewt bikim cemî'ê ferzan Tacdîn **ku** [çawa] didim ji dest xwe erzan?} Jixwe minaqeşe li ser »kû« nîne ji ber ko hemî kes dizanin wê (çawa) bi kar bîne. Lê belê, cardî jî ez dê nimûneyekê ji »Mem û Zînê« binivîsînim.

{Wan go tu ji **kû** ve têt, çî pîr î Xalib tu ji 'ilmekê xebîr î }
Piştî gelek lêpîrsînan jî, min nezaniye ka çima Kurdên Bakur, piştî mirina Celadet Alî Bedir-Xanî gihaneka »ko« guhartin û kirin »ku«. Texmîna min ew e ko kurdên Bakur ji tesîra »o«-ya qelew ya tirkî rabûn û »ko« wekî »ku« nivîsînin da wê wekî »o«-ya tirkî qelew bi lêv nekin. Heger wisa be ew sebebêkê bêbingeh e ji ber herfa kurdî »i« jî wekî herfa tirkî »i« têt nivîsandin. Lê belê, dengên wan ji hev cuda ne.

Vêca ji ber maneyên cuda û ji ber denganiya cuda ya hersê bêjeyên kurdî divêt ew wekî »ko«, »ku« û »kû« bêne nivîsandin. Ez jî hem di nivîsar û berhemên xwe de û hem di berhemên ko ez amade dikim de, xwe dispêrim metoda Celadet Alî Bedir-Xanî û wekî wî dikim.

Ev gotar ji malpera Avesta hatiye wergirtin